

Qirîza li Suriyê encax bi dînamîkên hundir dikare bê çareser kirin, derveyê ve em nikarin çareseriyê ji derve bigerin û bi hêviya ku hinek bân û pirsgrîkê çareser bikin, bisekinin. Wek rejîm û MSD'ê em hewceyî bi diyalog û nîqaşek berfireh a guhertin û veguhertina destûrek bingehîn dibînin û ev pêvajoya nîqaşan dibe demdirêj jî bajo. Di encam de pergalek ku bi salane hatiye rûniştin û navendî ye, heye. Di aliyê ragihandinê de ve mijarê deng veda, gelek alî, pêkhatayên nav bakurê Suriyê de dijîn, gelê Kurd, Ereb û Asurî di nav bendewariyê dene.



Muxatabên çareseriyê dînamîkên hundirîn

● Amadekar: Newaya Jin

Endama desteya rêveber a MSD'ê û berpirsa mekteba jinê Hana Derya di derbarê rewşa şer û aloziya li herêmê, dîsan daxûyaniya Federasyona Demokratîk a Bakurê Suriyê ya di derbarê bidawî anîne şer û avakirina jiyana demokratîk, her wiha guncaw kirina şert û mercên ve yekê de, bersiv da pirsên me.

Şer û destverdana li herêmê her ku diçe zêdetir dibe, dîsan bi pêvajoya dagirkeriya Efrînê re pêvajoyek nû a dagirkirina axa Kurdistanê hat destpê kirin. Hûn ve rewşa hevi û qirîza li herêmê çawa digirin dest û dinirxînin?

Ev demek dirêje Suriyê, bakurê Suriyê û qirîza di hundirê Suriyê de di rojeyê me de ye. Gelek êrîşên derve û di hundirê Suriyê de hatin lidarxistin, heta ev êrîş hîna jî didomin. Ji ber ku ev 7 sal in ev rewşa aloz dom dîke û hîna jî di hundirê Suriyê de lêgerînek rast a çareseriyê pêş neketiye, a hevi jî pirr lewaz e. Nayê xwestin ku di hundirê Suriyê de çareseriyek demokratîk bê avakirin. Bê guman ev şer û aloziya ku demek dirêje dom dîke, çî ji paytex Şamê; ew pergala navendî ya rejîma Suriyê ku bi salan deshilatdarî kiriye û çî jî ev çeteyên wek DAİŞ, El Nusra û hêzên ku xwe wek artêşa azad binav dikin, yek ser di nav vî şerê de cih digirin. Her çend li ser xerîteyê nehatibe xîz kirin jî lê, ji hêla demografîk de perçebûnek ber bi çav tê xuyan. Perçebûnek ji hêla mêtî û danûstandinê jî mijara gotinê ye.

Ev demek dirêje her kes dibêje em rûnên û pirsgrîkên hevi yên di hundirê Suriyê de, çareseriyên wê nîqaş bikin û ger pirsgrîkên di hundirê Suriyê de neyên çareser kirin ne pêkane ku qirîza li Tirkîyê, Îranê û Iraqê jî çareser bibe. Îro em dibînin ku çavê herkesê/î li Suriyê ye ka ve qirîza li wêderê çawa çareser bibe; ji xwe beşa herê bi hêz a ji bo çareseriyek her alî ya li Suriyê jî Kurd in. Ji ber ku li Rojavayê Kurdistanê jî destpêka pêvajoyê heya roja îroyîn, çî li hemberî deshilatdariya li Suriyê, çî jî li hemberî derve û hundir, Kurd her tim xwedî proje bûne û tim projeyên xwe yên çareseriyê pêşkêş kirine dakû bikaribin li Suriyê û bakurê Suriyê çareseriyek mayînde pêk bînin. Lewra em îro dibînin ku di hundirê Suriyê de piroyeyên heya niha hatine pêşkêş kirin, bi navê Kurdan hatine kirin.

Di tevahiya ve pêvajoyê de we gelek caran proje û xeta xwe a çareseriyê bi raya giştî re parve kir, gelo têkoşina we a ji bo çareseriyê çawa hat fêm kirin û dest girtin?

Bê guman gelek alî û derdor ve yekê naxwazin û nahêlin ev projeya çareseriyê kûr bibe. Ji ber ku Îran jî aliyekê ve, Tirkîyê jî ber bi aliyek din ve dikêşîne û du hêzên wek Emerîqa û Rusya jî li herêmê di nav şerek parvekirinê dene. Mirov dikare şerê li herêmê rû dide wek şerê cihanê yê 3'yan bi nav bike ku îro li ser axa Suriyê tê birêve birin. Îro çavê herkesê li ser Suriyê ye û du hêzên he-

gemon yên wek Emerîqa û Rusya di hundirê Suriyê de, li hemberî hev di nav şerê ka kê bi hêztir e dene. Helbet mijara çareseriyê wisa asan nîne, bi taybetî dema ku em xwe rakêşana hêzên cûda yên li herêmê dibînin, dîsan destdirêjiya gelek dewlet û aliyên din mijara gotinê be.

Nêzî 7 sale ku em hertim di mijara çareseriyê de bi israr tevdigerin û girîng jî dibînin. Me xwe wek pergala xweseriya demokratîk birêxistin kir, hebûnek me ya leşkerî û siyasî hat çêkirin û di cihanê de ev hêza xwe birêxistin kirina me deng veda. Îro dîplomasiya me di hundirê Rojavayê Kurdistanê û bakurê Suriyê de gihîşt astekê ku hêzek mezin a avakirinê bide çêkirin. Bi zîhnîyeta perçe kirinê nêz bûn, rê li ji hev qot bûna gel vedike. Gelên li ser axa Suriyê ku bi sedsalane bi hev re jiyane, tê xwestin ku ji hev bân xerîb kirin. Ev siyasetek cihê kirinê ye, ne çêker e. Di siyaseta hevi a li ser herêmê tê birêve birin de guhertina demografiya Suriyê, heta guhertina demografiya Kurdistanê jî tê armanç kirin.

Çima çareseriya aloziya li Surî û Rojavayê Kurdistanê tê asteng kirin, yegane aliyên çareseriya van pirsgrîkan kê ne?

Bi dagirkeriya Efrînê re xwestin ve yekê bikin, bi hezaran kes li ser axa xwe hatin koçber kirin, kesên cûda ji deverên cihêreng kom kirin û anîn li Efrînê bi cih kirin. Li hemberî van nêzikatiyan jî kesê dengê xwe nekir, dijderketinek nehat çêkirin. Li Efrînê du mehan şer hat îlan kirin, gel du mehan bi hêza xwe ber xwe da, lê dîsan jî deng ji tu kesekê derneket, li hemberî qirkirina Kurdan û dagirkirina Efrînê herkesekê çavê xwe, devê xwe û guhê xwe girt, nexwestin tu tiştêkê bibînin an jî bibihîsin. Li Cereblûs û Babê jî heman tişt hat jîn. Bi vî rewşa hevi re derve nikare bibe bersiva çareseriya pirsgrîkên me, nikare bibe hêza herê mezin a çareseriyên di hundirê Suriyê û Rojavayê Kurdistanê. Mînak beşek mezin û girîng jî destûra bingehîn a Suriyê ye, ger bê guhertin, hewce dîke ku li gor li hev kirina aliyên bê amade kirin. Dîsan hewce dîke hemû gelên li Suriyê bi çand û zimanê xwe bân nasîn. Pêwîste pergalek ne navend bê avakirin daku her kes bikare xwe perçeyek ji avakirina Suriya demokratîk bibîne.

Ji bo ve, me di 26 mehê de bang li hikûmeta Suriyê kir û ev banga me ji aliyê gelek ragihandînan ku dijîtiya ve hevdîtînek dîkin û şîrovek wiha ku ev hevdîtînek tenê hevdîtînek di navbera Kurdan û rejîmê de ye û ne ji bo hemû gelên li Suriyê ye, tê pêş xistin. Lê, kes an jî aliyên ku ve yekê dikin naxwazin projeya çareseriyê pêş bikeve. Nayê xwestin ku projeya me a ku hemû gel, çand, ziman û baweriyên cihê di nav xwe de dihevîne, bê dîtî.

Ji destpêka ve pêvajoyê heya roja îro yek ji hêza herê pêşeng a ve şoreşê jî jin in, jin li kurdêra ve projeya çareseriyê de cih digirin? Rola dikeve ser milê wan çiyê?

Em pêşengiyê ji şoreşa Rojavayê Kurdistanê re dîkin. Jin û şoreş, jin û siyasat, jin û jîngeh paras-

tin û di mijara jin û dîplomasiyê de me pêşketinek mezin da çêkirin. Wek jin jî me di tevahiya van pêvajoyan de destkeftiyên mezin bi dest xistin. Li ser van destkeftiyên ji xwe muzakere nayê kirin, ji ber ku destûra ku divê were nivîsîn hewce dîke bi pênuşa jinê jî bê nivîsîn, jin yekser di nav de cih bigire. Ji ber ku zîhnîyet, deshilatdarî, jî aliyê pergale ve yek alî nêz bûn, yek nêrîn, yek rengî tenê ger hebe, di vir de şerek her alî a li dijî jinê mijara gotinê ye. Yên ku herê zêde di vî şerê de zirar dîtî jin xwe jin bûn. Lê, li rexmê van hemû êrîşan yên ku ji bo tevahiya jinan bû pêşeng dîsan jina Kurd bû, ji bo jinan bû hêviya têkoşinê û bendên tirsê ku di van 7 salan de çeteyên DAİŞ'ê dabû avakirin, şikand.

Jina Kurd di tevahiya jinên li herêmê de guhertin û veguhertinek mezin da çêkirin, zîhnîyeta civakê a hevi têk bir. Dema ku em dibêjin maf û azadî, em yekser qala ve yekê dikin. Em qala belavbûna zîhnîyeta azad a jinê û kesayeta wê a avaker dikin. Ji bo ve yekê, hewce dîke di nav destûra bingehîn a bê amade kirin de, destûra jinê jî wek beşek cihê bê amade kirin. Helbet li hemberî ve hêza jinê herkes ecêbmayî me. Em dibînin, dema li herêmên cûda jinên Ereb jî destê çeteyan tîrîz kirin ka çawa çarşevên reş bi ser xwe de diqetînin. Bang dikin û dibêjin, 'me dîsan bêhna azadiyê girt.' Vaye, ev jî hêza birêxistin kirî ya jina Kurd û belavbûna feraseta jina azad dide nîşandayîn. Bê guman ji hêla siyasî û dîplomatiyê de jî xebatên me yên berfireh hene û hîn ev xebat didomin. Ji hêla leşkerî de jî me xwe di her qadekê de birêxistin kiriye.

Wek meclîsa jinên Suriyê jî gelek projeyên me yên ji bo çareseriyê çêbûn. Li ser navê mekteba jin, me li Latqî, Hems, Heleb û Şamê xwe gihan gelek jinan. Em îro li ser çî nîqaş dikin, li ser mafê jin di destûra bingehîn a ku ve nû bê amade kirin. Jin di van destkeftiyên de beşdarbûnek çawa dikare bide çêkirin, li ser rol û girîngiya cih girtina wê a di her pêvajoyekê de disekin. Jinên Ereb yên li qadên rizgar kirî bi dilxwazî nêzî ve pêvajoya ku me daye destpê kirin, bûn. Di pêvajoya avakirinê de jî Kongraya Star rolek girîng lîst. Jina Kurd li bakurê Suriyê û Rojavayê Kurdistanê pêşengtî kir. Di nav rêveberiyên giştî de cih girtina jinê, dîsan wek hevserok di nav rêveberiyê de cih girtin jî tecrubeyek baş bi xwe re da çêkirin. Ji xwe rejîm jî ji ve yekê ditirse, ne tenê rejîma Surî, hema bêje hemû hêzên deshilatdar ji beşdarbûna jinê, hêza jinê ditirsîn.

Di 26'ê Tirmehê de wek MSD'ê we bi rêveberiya Suriyê re hevdîtînek çêkir, ev hevdîtînek çî wateyê? Bi taybetî dewleta Tirkîyê ku li dijî van hevdîtînan di nav hewldanek çawa deye?

Bangavaziya hikûmeta Suriyê hat kirin, di 26 Tirmehê de. Helbet pêşeng a ve hevdîtînek jî hevalek me a jin bû, Îlham Ehed bû. Di navbera her du aliyên de nîqaşên pirr berfireh û ciddî hatin meşandin. Ez dikarim ve yekê bibêjim ku ev cara yekê ye rejîm bi awayek fermî banga ji bo nîqaşê dîke. Di van 7 salan de heya niha daxwa-

zek wiha ji aliyê rejîmê ve nehatibû kirin. Heta niha em wek hêz nedîtî, nexwestin bibînin. Em dizanin ku niha li Suriyê opozîsyon nemaye, muxalefetek ku Suriyê bi hêz bike û bibe hêza çareseriyê nemaye. Li ser bangavaziya hikûmetê heyet çû, bê guman gelek nîqaş hatin kirin. Niha di pergala Suriyê de 'îdarên meheli' hene, ev jî zêdetir ji hêla xizmet kirinê de tê dest girtin. Navendî ye û çîqaş meclîs, walî hebin jî ji navendê erkdar kirin tê çêkirin. Pergala xweseriya demokratîk, pergalek ne navendiye, demokratîk û xeta sêyemîn temsîl dîke, dikare bibe deng û rengê hemû gelên li ser ve axê dijîn. Bi hêza xwe a hundirîn dixebite, feraseta xwe a çandî, ekolojîk, dîplomatiyê û hwd. pêş xistiye.

Di encama ve hevdîtînek de nîqaşek wiha derket holê ku du komîte bân avakirin, komîteyek ku bikaribe ferq û cûdatiyên di navbera rêveberiyên xweser û 'îdarên meheli' ku navendî ye, derxîne holê. Komîte bi hev re dişopînin, encam çibe ve bê destnîşan kirin. Ji ber ku qirîza li Suriyê encax bi dînamîkên hundir dikare bê çareser kirin, derveyê ve em nikarin çareseriyê ji derve bigerin û bi hêviya ve hinek bân û çareser bikin, bisekinin. Wek rejîm û MSD'ê em hewceyî bi diyalog û nîqaşek berfireh a guhertin û veguhertina destûrek bingehîn dibînin û ev pêvajoya nîqaşan dibe demdirêj jî bajo. Di encam de pergalek ku bi salane hatiye rûniştin û navendî ye, heye. Hewceyî bi pêvajoyek nîqaş û danûstandinê heye. Di aliyê ragihandinê de ve mijarê deng veda, gelek alî, pêkhatayên nav bakurê Suriyê de dijîn, gelê Kurd, Ereb û Asurî di nav bendewariyê dene. Ji xwe wek rejîma berê nabe, pêdivî bi guhertinê heye.

Bi taybetî dema ku em ji nû de însa kirina jiyana demokratîk a li Federasyona Demokratîk a Bakurê Suriyê bigirin dest û binirxînin, hewceye em rola Kurdan a di çareseriya qirîza li Suriyê de çawa fêm bikin?

Wek MSD destê me bi hêz e. Em hêzek çalak a leşkerî ne ku bi sed hezaran km erd rizgar kirine û projeyên xwe yên çareseriyê hene. Û em hêzêkin ku her roj xwe ji nû de ava dîke.

Helbet em li Suriyê û tevahiya herêmê yegane hêzin ku xwedî projeya çareseriyê ne. Ji bo ve jî rola Kurd di vir de girîng e û amadekariyên me yên di ve mijarê de berfireh in. Bê guman em wek Kurd aligirê Suriyek demokratîk û Federasyona demokratîk a Bakurê Suriyê ne. Em dibînin ku îro jî dewleta Tirk a dagirker, Erdogan bi awayek hovane êrîşê çand, erd û hebûna me dîke. Di şexsê Efrînê de êrîşê tevahiya destkeftiyên gelê Kurd hat kirin. Li beramberî ve hovîtiyê jî guhertinek her alî hewce dîke, pêdivî bi yekîtiyek Navnetewî a hem li derve, hem jî di hundir de heye. Dîsan wek Kurd jî pêdiviya me bi bidest xistina hêzek wiha heye.

Em wek Kurd di hundirê Suriyê de xwedî tecrubeyek dîrokî ne. Kurd ji vir şûnde jî dikarin ji aliyê maf, proje, xweserî û di mijara avakirina pergalek xweser avakirin û meşandin de jî rol bilîzin, ji xwe di ve mijarê de jî hêzeke xwe a pirr mezin derxist pêş.